42 salan belengazî di bin siya rejîma faşîstên Tehranê de
R:7

Erkê me di xebata netewî de çiye
R:3

Efrîn Tawana Serdemê ye
R:4

Salek li ser danûstandinên Kurdî-Kurdî re
R:8

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (396) 21-04-2021 Buha (1000) Tûmen

Xatirxwestina dawî ji yadigarê hemaseyên Kêleşîn û Pîranê

Roja Şemî 21ê Xakelêwe ya sala 1400`an a Rojî, rêûresmeke mezin bi beşdariya endamên rêberayetî, kadr û pêşmerge û endamên PDKÎ û beşdariya çendîn hey`etên aliyên siyasî û nûnerên dezgehên hikûmetî yên Herêma Kurdistanê, bona bi axsipartina termê nûtirîn şehîdê PDKÎ û Endamê Hey`eta Birêveberiya Navenda Siyasî yê PDKÎ, şehîd "Luqman Mêhfer", hate lidarxistin.

Destpêka rêûresmê termê şehîd "Luqman Mêhfer" bi gulan ve hate pêşwazîkirin û bi rêje û sana leşkerî ya hêza Pêşmergê Kurdistanê, ber bi goristanê şehîdên PDKÎ ve hate veguhastin.

Di wê beşê de, bi xwendina sirûda netewî ya "Ey Reqîb" û demek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê, termê şehîd "Luqman Mêhfer" li goristana şehîdên PDKÎ bi axa pîroz a Kurdistanê hate spartin.
Piştre çend beyt ji sirûda "Ey Şehîdan" ji aliyê hêza Pêşmergê Kurdistanê ve hate strandin.
Piştî sirûda "Ey Şehîdan", Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ "Mistefa Hicrî", li derheq kesayetiya bilind a şehîd "Luqman Mêhfer" gotarek pêşkêşê beşdarbûyên taziya şehîd "Luqman" kir. Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ "Mistefa Hicrî" got: "Şehîd li çanda PDKÎ de nirxeke gelek bilind heye, her ev nîne ku di Hizbê de xebatê dike, belkî bilindbûna şana şehîd di PDKÎ de armancên bilind in ku rizgariya netewa wî ye, lewma her kesek li rêya netewa xwe de şehîd be, serbilindiyeke mezin e ku dibe nesîbê wî li ber vê yekê ku xwe fîdayê gel û nîştimana xwe kiriye".

Herwisa "Mistefa Hicrî" got: "Kak Luqman kadrekî bi wec yê PDKÎ û kaderkî rêberatiya PDKÎ bû, ku ji temenê ciwaniya xwe tevlî refên PDKÎ bibû û li warên cor bi cor ên xebat li vê Hizbê de hemû ceribandin, ji pêşmergatiyê ve heta birêveberî û endametî li rêberatiyê, gelek ezmûn hebûn".

Piştre Cihgirê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ û Berpirsê Navenda Siyasî ya PDKÎ, "Hesen Şerefî", bi nûneratiya Navenda

Siyasî û Rêberatiya PDKÎ, çendîn gotin pêşkêş kir.

Navbirî li gotinên xwe de ragihand: "Şehîd Luqman Mêhfer ji berê ve hogirê xebata rizgarîxwazane ya welatê xwe bû û li temenekî kêm de tevlî refên têkoşerên Demokratê bibû û li wê rêyê de ti fîdakariyek nema ku neke, lewma jidestdana şehîd "Luqman" li refên têkoşerên Partiya me janeke kûr li ser Partiya me û xisareke berçav bo bizava rizgarîxwaziya netewa me li Rojhilatê Kurdistanê ye".

"Hesen Şerefgî" di berdewamiyê de got: "Hekî binyat û pêgeha hizriya kak "Luqman" cihgîrbûna wî li refên têkoşerên Demokrat bû, binyat û pêgeheke din jî di nav malbata wî de hebû ku di parktîkê de, derfeta xebatê bo şehîd "Luqman" afirandibû û ew jî endamên malbata wî bûn".

Yek ji yadigarên şehîd "Luqman", keça wî ya li derveyê welat "Gelawêj Mêhfer", helbestek li ser bavê xwe nîvîsandibû ku ji aliyê pêşkêşkarê rêûresmê ve, pêşkêşê beşdarbûyan hate kirin ku rengeke din bi rêûresmê da.

Piştre kurtiyek ji jiyana pir ji berhemên şehîd "Luqman Mêhfer" ji aliyê Endamê Desteya Birêveberiya PDKÎ, "Fuwad Xakîbeygî" ve hate xwendin.

Di beşeke din de kurê şehîd "Luqman" "Qadir Mêhfer" bi nûneratiya malbata "Mêhfer", çend gotinek pêşkêş kir.
Di dawiya rêûresmê de, destegula rêzgirtin ji aliyê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ "Mistefa Hicrî" û "Qadir Mêhfer" ve, li ser tirba şehîd "Luqman Mêhfer" hate danîn.

Endamê Hey`eta Îcrayî yê Navenda Siyasî ya PDKÎ, Şehîd "Luqman Mêhfer" li sibêzûya roja Şemî 21`ê Xakelêwe, piştî mehek berxwedan digel Koronayê, li yek ji nexweşxaneyên bajarê Hewlêrê koça dawiyê kir û rê û rêbaza xwe bo rêvîngên rêbaza pir ji serweriya şehîdan bi cih hişt.

Sergotar

Kavilî



N: Kerîm Perwîzî

Hin desthilatên siyasî hene ku di dema pênasekirinê de, tu dikarî bêjî wekî sîsteme demokratîk yan jî bêjî nîvedemokratîk in yan bêjî ew sîsteme totalîter e yan tevavxwaz e. Pênasekirina sîstema siyasî ya hakim bi ser welatekê de feraset û çarçêveyeke giştî diafirîne û çavnihêriya te ji wê sîstemê eva ye ku ev pênaseya bo hatî kirin bi kiryareke çavnihêrîkirî kar bike.

Lê bo rejîma Komara Îslamî tu nikarî pênaseyeke wiha bo bikî, çimkî kiryarên wê rejîmê di wan çarçêvan de cih nagrin û di rastî de ger wiha bê pênasekirin, çavnihêriyek bo te tê pêş ku tu wisa dizanî rejîm ew pênaseya ku hatî gotin di wê warê de kar dike, ku çi di rastî de tu cureyeke din dibînî!

Em birohnî bêjin, tu dikarî tenê bo rejîma Komara Îslamî "kavilî" pênase bikî. Çimkî ne tenê li warê siyasî û aborî û civakî de welat kavil kiriye û hem xwedê dezgehên hakim jî bûne kaviliyeke tevav, belkî di kiriyar û gotarên rejîmê de jî kavilî, bi tevav wate ye.

Behsa herifîna sîstema aborî û siyasiya wê li aliyekê û behsa herifîna wê rejîmê li hember Koronayê aliyek din a meselê ye û xwedê Wezîrê Tendirustî yê rejîmê jî gotibû di hember Koronayê de şikest xwarine. Lê ya ku li hemû demekê rohntir ji ber çav e, rewiş û qonaxên cuda yên demê ne ku tenê tu dikarî jê re bêjî rejîmek kavil! Kavilbûna wê rejîmê vê demê bi rohnî tê dîyarîkirin ku berpirsê dosiyaya çekên navkî yê wê ku pasdarek bi navê Fexrîzade bû, dikujin û berpirsên rejîmê nizanin çawa kuştin û çi hate qewimîn! Her yek ji wan senaroyekê bas dike û di dawiyê de bêdengiyê jê dikin!

Binkeya Netenzê ku dehan milyard Dolar xercê wê kirine û bi sedema wê dosiyayê sedan milyard Dolar zirara aborî bi welat dane û sedan milyard Dolar ji tehrîman bi sedema binkeyên wekî Netenzê tûş bûye, eva jî di halekê de ye ku di dema teqîn û wêrankirina Netenzê de, berpirsên rejîmê nizanin çi qewimî ye û her yek ji wan tiştekê dibêjin û di dawiyê de jî, navê kesekê tînin û dibêjin wî kesî ew kare kiriye û ji balafirxaneya Îranê ve çûye derveyê Îranê!

Yan Cihgirê Fermandê Spaha Quds a terorîst dimire, Spaha Pasdaran dibêje bi sekinîna dil miriye, berdevkê wan dibêje bi nesaxiya kîmiyayî miriye, kesên wan yên din jî dibêjin bi alxahînî ve şehîd bûye! Heta nizanin fermandê mezin yê terorîstên wan çawa miriye!

Di belavbûna nesaxiya Koronayê de jî, "Weliyê Feqîh" bi vê aliyê bê şermî ve dibêje em vaksena Koronayê ya bîhaniyan nakirin û çend meh piştre Serkomarê rejîmê dibêje, di du hefteyan de divê em du milyon vaksen lêbidin û beşê çendîn salan vaksen jî li derve bikirin! Êdî çîroka dezgeha "Muste`an" a Spaha Pasdaran jî, ku digotin bi firankas û filan vîrûsê di mewdayeke dûr de peyda dike, bila her bimîne, eva jî di halekê de ye ku tev ev axavtinane ti piştîvaneke zanistî nebû û direwke mezin a dîroka zanistê bû!

Tev ew bûyeranane dibêjine me ku kar ji vê yekê derbas bûye da ku nav û pênaseyeke standard, heta peyva dîktatorî û tevavxwazî jî bo wê rejîmê bê bikaranîn, belkî tenê û tenê pênaseya "kavilî" derxerê naverok û herwisa rûmeta rasteqîneya rejîma hakim li Tehranê ye.

Erkê me di xebata netewî de çiye?

N: Nûredîn Sofîzade

Xebat li pêxema bidestveanîna mafê netewî, an ku bidestxistina hemî ev mafên ku neteweyekî serdest û xwedî kiyan û serbixwe hene, xebata netewî ye.

Neteweyek dikare xwedî kiyan be û demekê dikare qedera xwe bi dest ve bîne ku, xwediyê axa, nasnama, çand, perwerdeya bi zimanê xwe, parastina ewlehiya xwe, birêvebirina îdariya welatê xwe, serwet û heyî û neyiya nîştmana xwe bigire destê xwe û xwe hakim û birêveberê xwe be, wê demê ew netewa xwedî kiyan e û mirov dikare bêje ku qedera wê di destê wê de ye û li jêrdestiyê xelas bûye.

Gelê Kurd jî bi dirêjiya dîrokê cehd û xebat kiriye ku bibe xwediyê wan deskevtan û weke hemî netewên dinê yên serbest xwediyê qedera xwe be.

Gorî taybetmendiya xebata Kurd li seranserî Kurdistanê, û herwisa gorî reftar û serderiya hikûmetên dagîrker ku Kurdistan bi ser wan de hatiye parparkirin, awayê xebata Kurdan li her kîjan ji perçên kurdistanê, bi taybetmendî û şêwaza cuda hatiye meşandin.

Bi berçavgirina derfetan ku kîjan şêwaza xebatê karlêker e, xebat hatiye kirin, qonaxên cuda cuda derbas kirine, em dikarin bêjin ku Kurdan hemî şêwazên xebatê bona gihîştin bi mafê xwe ceribandine, weke xebata siyasî, dîplomasî, medenî, girseyî, nerizayetî û xwenîşandan, nefermaniya medenî, şerê parastina rewa wate berevanî ji man û mewcûdiyeta xwe, şerê çekdarî…hwd.

Di hember wê xebata berheq a gelê me de jî, dijmin û hikûmetên dagîrker, bi armanca tepeserî û matkirina dengê rizgarîxwaziya Kurdan, wan jî hemî hêza xwe û hemî şêwazekî wekî, komkujî, êrîş, kuştin, girtin, enfal, kîmiyabaran, bê serûşûnkirin, îdam, zîndan û terorkirin bikar anîne û ti cure çek û tepeserî û hêzek nemaye ku bi dijî netewa kurd bikar neanîbe.

Di wê xebata pir xwîn û qurbanîdan û dûr û dirêj de jî, erkê sereke ya di hember dijmin de rawestiyane jî, pitir kevtibû ser milê şorişvanê çekdar ên Kurd ku bi Pêşmerge hatiye naskirin, ez bawer im renge parek ji wê ku heya niha doza Kurd wiha maye û sernekevtiye, her eva bûye ku şoreşa me nebûye şoreşa hemî gelê me û gel li benda hindê bûne ku şoreşvanê Kurd an ku pêşmerge divê li hember dijmin şer bike û divê Kurd û Kurdistanê biparêze û di encamê de eva tenê erkê pêşmerge ye ku rizgariyê bo gel bi dest ve bîne.

Herçiqas gelê me yê Kurd ti caran rol û fîdakariya pêşmergên xwe yên qegreman nikare nedîtî bizane û bêguman gel pê dizane û xwe deyindarê keda şoreşvanê xwe dizane, lê eva tenê ne bes e û têra nake, çimkî pêşmerge jî takekî Kurd e û hest bi berpirsayetiyê kiriye, lewma xwe erkdar zaniye ku bona parastina gelê xwe li hember dujminan de dest avêtiye çeka parastinê, ku wisa ye erkê kit bi kitê Kurdan e û evê ku xwe Kurd dizane û dilê wî bo rizgariya Kurdistanê lêdide, divê ev jî xwe erkdar bizanin û kê/kî kîderê li pêxema serxistina doza netewî de ji dest tê xemsariyê neke.

Ku wisa ye em hemî erkdar in, divê her Kurdek xebatê bike, xebat tenê çek hilgirtin û şer û çûna ser çiya nîne, ez bawer im di wî warî de gelê me hinde xortên şoreşgêr hene hu hewce nebe em hemî çekê hilgirin, lê erkê ku dikeve ser milê me dikare cuda be.

Her Kurdek gorî derfetê dikare pêngaveke xêr bo xizmeta doza gelê xwe biavêje. Her kurdek ku bikare parêzvaniya çand û ziman û wêjeya xwe bike, her Kurdek ku bikare hesta netewî û gelhezî û welatparêziyê di nava xortan de bigeşîne û xurt bike, her Kurdek ji bazar, bajar, gund, dewlemend, belengaz, rêncber, xwendevan, mamosta, jin û mêr bikarin hekî tenê bi dil û hizir be jî digel şoreşê û pêşmerge bin, bêguman ew jî dikevine rêrewa pêşxistina xebatê.

Her kesê ku hekî jê çênabe ku her bixwe bibe pêşmerge û şerê parêzvanî ji Kurd û Kurdistanê bike, aliyê kêm li her kîderê derfet hebe dikare qiseyekî xêrê bike, li mizgevt, zanîngeh, qutabxane, bazar û di nava her civînekê de, hekî bi erênî nikare basa doza xwe bike, aliyê kêm bila nekeve nerênîgotinê û dijberiya xebat û xebatkaran.

Erkê ser milê het Kurdekê ye ku bi can û mal û hizr û kiryar xwe piştîvanê şoreşgêran bizane, evên ku nikarin başiyê bikin, aliyê kêm ez bawer im ku tenê bo wan ev hinde bes e ku nebine tora dijmin û bi dijî gelê xwe û şoreşvanên Kurd dernekevin, hekî hemî Kurdek karî bi wî awayî erknas be, bêguman mirov dikare bibêje ku me pêngavek li pêxema doza gel de avêt û me erkê xwe bicî gihand, ew pêngave jî dikare yekîtî û yekrêzî û yekarmanciyê di nava gel de çê bike.

Efrîn Tawana Serdemê ye

N: Mihemed Hesko (birasoz)

Barzaniyê Nemir dibêje:"Eger te xizmet welatê xwe nekir, bikêmî xiniziyê lê neke"!?

Digel derbasbûna sê salan bi ser dagîrkirina Herêma Efrînê re ji aliyê dewleta Tirkiyê û hevpeyman û hevalbendên wê ve, ku ji girûpên Îslamiyên tundajo dijberên Sûriyê pêk tê, ji wê rojê de û ta niha, herêmê hemû reng û riftarên hovane û yên dûr ji hemû rewişt û prensîbên mirovî bi xwe ve dîtiye û hîn jî dibîne, ji kuştin, revandin, îşkencekirin, her wiha hemû cure karên terorîstî ji talankirin, dizîkirin, standina xukî û spandina bacê bi ser rûniştvanên Kurd de berdewam e.

Sê sal in qîrîn, nalîn û hawara gelê me ye ku ji dest xwînrijan, xwînmijnan û hovên dulingî dinale, dagîrkerên nandoz û xwefiroş tawanên xwe bi kîneke reş û dirindeyî, herwiha bi dilkûriyeke bê hempa û li pêş çavên civaka mirovî û ya navdewletî encam didin û tawana herî mezin jî, tawana guhertina demografî ye, wate guhertina nasnameya Kurdî ya herêmê ye, herwiha dabirrîn û hilkirina reh û tamarên Kurdbûna herêma Efrînê ye!

Rizgarkirina bi rêkevtin, pîvera rastîneya her kesî an rêxistinekê helwest û riftara dirust û bidestveanîna destkevtiyan e, mixabin destkevtiya Partiya Yekîtîya Demokrat (PYD) li Rojavayê Kurdistanê radestkirin bû, wek tê zanîn bi birayer û rêkevtinek di navbera rejîma Sûriyê û PYD`ê de hate şanenavkirin, ew jî radestkirina Rojavayê Kurdistanê bo PYD`ê bû, û awayê serdestbûna PYD`ê li hemû herêmên Kurdî bi giştî û li herêma Efrînê bi taybetî vê yekê piştrast dike, tevî ku şanoyeke eşkere û gelek zelal bû, lê mixabin piraniya gel kete bin bandora propagendeya "Şoreşa Rojava" û bawer kirin ku "şoreşe ne rûreş e" ku dema rêxistineke Kurd bibe şûnkarê rejîmeke stemkar û şofînizim, ku ta niha dan bi hebûna gelê Kurd li Sûriyê nekiriye bê guman rûreşî ye!

Ji berxwedana serdemê bo tawana serdemê, hemû gelên bindest da ku bigihêjn azadiya xwe û serxwebûna welatê xwe, berê xwe didin karê rêxistinî û wek alaveke bingehîn ji bo serxistina armancên xwe pêk tîne û da ku bi bername û bi pilandarêjî û bi hevrayîkarîn û şiyanên xwe bînin ser hev û bibe hêzek û dest bi xebata xwe ya bo rizgarkirina welat bike, herwiha li her dewletekê an civakeke serbixwe, rewşenbîr û ronakbîrên wê bi armanca pêşvebirina civakê û pêkanîna guhertinan û serîhildan li hember nedadperwerîya civakî û neyeksaneya siyasî dest bi karên rêxistînî dikin da ku şoreşên xwe bi ser kevin. Mixabin tenê li Rojavayê welatê min rêxistinên ku bi armanca rizgarîkirin û bidestveanîna mafên neteweyî dibin rêgir û kelem li pêş pêvajoya rizgarbûna gel û welat, mixabin bi ser barê sitemkariya bindestîyê de hin rêxistin bûne serbar û rêgire, û wisa ye tawana Efrînê mînaka herî berçav e.

Ji roja serdestbûna PYD`ê li Rojavayê Kurdistanê bi giştî û li herêma Efrînê bi taybetî, vê yekê kir ku Tirk çavên xwe berdin herêmê û dîtin ku eve baştirîn derfet e bo dagîrkirina herêmê bi hêceta ewlekariya neteweyî, li aliyê din ji prensîbên nîştimanî û neteweyî ye ku her rêxistineke Kurdî berjewendiyên neteweyî bi ser berjewendiyên xwe re bigre, û eger wiha neke wê gelek pirs bikevin holê, ka gelo biryader û karbidestên herêma Efrînê li ser

çi bingehê biryara berxwedanê li hember Tirkiyê derkirin û ya balkêş û li berçavan hevberkirina hêza leşkeriya PYD`ê digel hêza leşkeriya Tirkiriyê ye ku duyem hêza leşkeriya hevpeymana Nato ye û pêwîstî bi zanayan û pisporên stratîjîk nîne ku herdu hêz nayên berhevkirin, tevî ku wek roya li ezmên eşkere bû, dîsan biraya berxwedanê wate biryara xwekuştinê hate standin! Û ev yek pêngava yekem bû bo hêncetdana dagîrkirinê û paşê pêkanîna guhertina demugrafiyê?

Ma gelo çima çarenivîsa gel û pêşeroja herêma Efrînê evqas li cem karbidest û biryarderên herêmê negirîng bûn? Gelo çima berevajî hemû rewşên şer û çengan li şûna ku rûniştvanên bajarê Efrînê bişandina gundên herêmê, gundên herêmê ji rûniştvanan bi darê zorê hatin valakirin û berên wan dan bajêr û ji wir jî berê wan dan panegha "leşkergeha binçavkirinê" Şehbayê? Ma gelo ev yek ne pêngava duyem bû bo valakirina herêmê ji Kurdan da ku pilana guhertina demugrafî were pêkanîn!?

Derfet û sûdwergirtin, bi sî û saya şoreşa gelê Sûriyayê PYD`ê bo xwedîdesthilat û rênimayên hevalbendên xwe bi cih dikir, ew jî bi dûrxistina Kurdan ji çalakî û beşdarîkirin di xwepêşandanên dijî rejîma Be`isa dîktator de û spandina dîfaktoyê bi ser civaka herêma Efrînî û hemû deverên Rojavayê Kurdistanê de û ji ber sepandina biryara leşkerkêşiya neçar gelek malbat ji herêmê derketin, mixabin geşbîniya Kurdan bo reşbîn, mixabin piştî sedsalek ji stemkarî û bêparîbûn ji hemû mafên neteweyî, bi serhildana gelê Sûriyê re, gelek kulîlkên hêviyên bi destveanîna mafan di dilê Kurdan de vebûn, lê mixabin bi dirêjahiya dîrokê em ji destdana derfetan de gelekî serkevtî ne, li şûna ku Kurdan hin mafên xwe dabîn bikirina, bingeh û hebûna Kurd li hersê herêman Efrîn, Girê Spî û Serê Kanîyê ketin metirsiyê û dibin gefa nemanê de ne.

Erê mixabin tenê li welatê min dîrok bi şikestîxwarin di nepêkanîna destkevtan de xwe dûbare dike, di bêhêvîkirin û nizimkirina morala gel de xwe dûbare dike, di lîstikên neyaran de û xapandina Kurd bi destê Kurdan xwe dûbare dike, dema ku rêzan û siyasetmedarên me rêxweşker bin û zemînexweşker bin bo dagîrkirina beşek ji axa Kurdistanê, wê demê xwefiroşî û xinizî ye, her wiha dar û destik in, ne leheng û nûnerên gel û welat in û nebin bernaê gel wek çawa pêşînên me gotine "ger tu berxê dijmin bî, tu nabî bernaê gelê xwe"? wek çawa PYD`ê bihaneder û rêxweşkerî kir ji dagîrkirinê re, mixabin Encûmena Kurdî ya Sûriyê (ENKS) jî rewatî û belgeyên dagîrkirinê dan dest Tirkiyê di proseya Çiqê Zeytûnê de, mixabin ev e jî bawernameyeke ku hîn me ti wane ji dîroka xwe wernegirtine, ji ber vê yekê tirsa min ji wê tiresê ye ku, eger rewş bi vî rengî berdewam bike wê tawanên wek tawana Efrînê dûbare û sêbare bibe, lê bila herkes bizanibe ku, kesên bi bayê berjewendiyên neyarên serdest re hat, wê bi barana berjewendiyên neyarên serdet re jî here!?

Almaya, 19.04.2021

Dengê dihola şer e, yan kozîkirina Îranê Ye?

N: Serbest Urmiye

Di dema xwe de bersiv dê were dayîn. Eva ev gef in ku di heyamê wan çend salên dawiyê de ji rayedar û berpirsiyarên payebilind yên rejîma Îranê li hember êrîşên bi ser bingehên wan yên leşkirî û sixuriyê li derveyê sînorên Îranê, kuştina kesayetiyên wan yên baş di warê navkî û leşkerî de û êrîşên li ser bingeh û navendên meyanidina Uraniyom û lêkolînên navkî yên rejîmê nemaze navenda sereke ya bi navê Netenzê de tên guhdarîkirin. Gefên ku encama wan heya niha tenê kuştina hejmarek ji xelkê sivîl di rêûresma veşartina termê pasdar Qasim Silêmanî yê fermandarê bilind û berpirsê Spaha terorîstî ya Quds li bajarê Kirmanê bû û piştre jî xistinaxwar a balafira Okraynê û kuştina 176 kesên sivîl.

Di heyamê çend mehên borî de, êrîşên dewleta Îsraîlê bo ser navendên leşkerî yên rejîma Îranê, sînorê şûriyayê derbas kirine û gihîştine hundirê Îranê. Ji bilî êrîşên saybirî ku heya niha Îsraîl îdia dike ku li ser navendên navkî yên Îranê de hebûne, Payîza sala borî rejîma Îranê kuştina kesayetiyê baş yê navkî yê xwe wate Muhsin Fexrîzade jî xiste stuyê Îsraîlê û gefa tolhildanê ji Îsraîlê xwar. Herçend ku heya niha dewleta Îsraîlê ev yek piştrast nekiriye, lê vê gerrê û piştî êrîşa bo ser navenda sereke ya navkî ya Îranê li Netenzê di çend rojên borî de, bi eşkere ragihand ku wan ev êrîş kiriye û çi car rê nadin ku Îraneke xwedî hêza navkî di herêmê de hebe ku gefê li tenahî û ewlehiya wan bike.
Gelo Îsraîl dihola şer dikute?

Pistî guherîna desthilatê li Emerîkayê de û hatina ser kar a Serkomarê nû li wî welatî de, cardin pirsa lihevhatina navkî ya di navbera Îran, Emerîka û aliyên Ewropayî de kete rojevê ku weke tê zanîn di rojên borî de civîn di navbera wan de çêbûnê. Lihevhatina navkî ku di serdemê serkomariya Obama de derket holê û hin derfet ji rejîma Îranê re anîn holê ku heya qasekê dorpêçên aborî ji Îranê re sivik bike, wê demê jî rû bi rûyê nerazîbûna Îsraîlê hat. Ev jî ji ber vê hegerê bû ku rejîma Îslamî ya Îranê hertim gefa ji holêrakirina Îsraîlê dixwa û dixwe û weke metirsiyekê li ser tenahî û ewlehiya Îsraîlê tê zanîn. Lewma hebûna rejîmeke bihêz û xwedî çekên navkî di herêmê de, ne tenê weke gef bo ser Îsraîlê, belkî gef bo ser hevalbendên din yên Emerîkayê jî tê mêzekirin. Di demekê de ku rejîma Îranê bi kiriyar ew yek selimandiye.

Di derheq êrîşa vê dawiyê ya ser navenda meyandina Uraniyomê ya li Netenzê ku dezgehên leşkerî û ewlekariyê yên Îsraîlê îdia dikin ku karê wan bûye, dikare şiroveyên cuda hebin.

Malpera ”Ynetnews” daye zanîn ku berpirsên Îsraîlê êrîşa li ser Netenzê ji ber berjewendiya welatê xwe, nemaze di rewşa nû ya zal di rojeva welatê xwe de bi lezgînî eşkere kirin.
Hin alî jî dibêjin ku merem ji wan êrîşan neçarkirina Îranê ye ku stuyê xwe li hember aliyên ”BERCAM” (wate lihevhatina navkî ya di navbera Îran, Emerîka û aliyên Ewropayî) de, xwar bike û bê merc vegere ser maseya danûsitandinan.

Hin alî jî hene ku vê yekê girê didin bi peymana hevkariyê ku Bihara îsal di navbera Çîn û Îranê de kete rojevê. Li gor baweriya wan hatina dewleta Çîn a hevrikê Emerîkayê, nemaze di warê aborî de, bi destekî vekirî bo herêmê, dikare tehlûkeyek be li ser berjewendiyên Emerîkayê û hevlbendên wê yên herêmê û rêyekê jî dide peşiya Îranê da ku heya qasekê bi ser dorpêçên aborî de baz bide û neçar nebe guhdarî lihevhatina xwe ya navkî be. Ew yek heya qasekê dikare ku destê rejîma Îranê vala bihêle ku mercên xwe bi ser aliyên wê lihevhatinê de bisepîne yan bide sepandin.

Aliyeke din a vê pirsê wiha tê şirovekirin ku merem ji êrîşên han, vejandina derfetê ji Emerîkayê re be. Li gor vê şiroveyê, êrîşên han dikarin bibin hegera lawazbûna Îranê nemaze di warê meyandina Uraniyomê de û kirîna demê bo Emerîkayê. Di rewşeke wiha de demeke di dirêjtir dikeve destê dewleta nû ya Emerîkayê de ku bikare bêhtir û bi awayeke baştir aliyên lihevhatin û danûstandinê berhev bide û danûstandinan kontirol bike. Di vê derheqê de xatûna n”Dr. Or Rabinowitz” karnasa çekên navkî ya zanîngeha Orşelîmê, di hevpevînekê bi malpewa ”Ynetnews” re wiha dibêje ku: ”Wiha dixuye ku Emerîka jî, bi vê êrîşa Îsraîlê re kêfxweş be. Ji ber ku him

»»» Dom R:6

»»» Doma R:5

berjewendiyên Emerîkayê dabîn kirine û him jî demeke zêde daye dest Emerîkayê da ku bêhtir danûstandinan bidomîne".

General "Amos Yadlin" serokê berê yê dezgehê parastina zaniyariyên leşkirî yên Arteşa Îsraîlê dibêje ku encamên guşarê di heyamê serokatiya "Donald Trump" de bo ser Îranê, berevajî derketin û ne tenê nebûne sedema sekinandina çalakiyên navkî yên Îranê, belkî pêşde jî birin û bûne sedem ku di danûstandinên Viyenayê de Îran xurttir derkeve. Ew herwiha di vê baweriyê de ye ku heke erîşa vê gerrê ya ser Netenzê, ji bilî çavkaniya sereke ya elektirîkê, çavkaniya alîkara wê jî asteng kiribe, vê demê mirov dikare bêje ku Îranê ji bo nûjenkirina wan, demeke dirêj hewce ye.

Herçend ku Serkomarê nû yê Emerîkayê, daxwaz ji Îsraîlê kir ku êrîşên xwe bo ser navendên navkî yên Îranê bide sekinandin, lê rayedarên leşkerî û ewlekariyê yên Îsraîlê dane zanîn ku dê berdewam bin. Eva di demekê de ye ku dewleta Îsraîlê jî ragihand ku di danûstandinên di navbera Îran û Emerîkayê de, dê alîkariya Emerîkayê bikin.

Îcar li gor wan şiroveyan mirov texmîn dike ku êrîşa han heke bi meremeke din jî be, dikare demê ji bo danûstandinan bo Emerîkayê bikire.

Dîsan bêhna yohlihdanê tê Ji bo xwedê bi balafiran dernekevin, dîsa bêhna tohlihdanê tê. Eva gotina hin bikarhînerên tora întêrnetê ye di Îranê de, piştî ragihandina berpirsên bilind yên Îranê û nemaze Wezîrê Karûbarê Derve û Serokê Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê ku dê dema xwe de bersiva Îsraîlê bidin.

Niha qala tolhildanê di nava organên rejîma Îranê de tê kirin, ev jî di demekê de ye

ku aliyên rejîmê berî berhingarî Îsraîlê bibin, berbûne hev û hevdu tometbar dikin di neparastina berjewendiyên rejîmê de û valakirina destê neyaran di karûbarên hikûmetê de. Îshaq Cehangîrî, Cihgirê Serkomarê rejîma Îranê dibêje ku divêt aliyê berpirsyar û sûçdar di parastina navenda Netenzê de were kifşkirin û cezadan, lê bi eşkere aliyê han nade kifşê. Di hember de Muhsin Rizayî, fermandarê payebilind yê leşkirî yê berê yê Spaha Pasdaran û serokê niha yê civata parastina berjewendiyên rejîmê, bi eşkere dibêje ku bûyerên ku di qada ewlekariyê de di heyamê borî di Îranê de derbas bûne didin xuyakirin ku sîstema ewlekariyê kêrhatîbûna xwe ji dest daye û hewceyê çareseriyê ye. Lê ya ku cihê tirsê ye eva ye ku gellek şirovekar, hin berpirsên hikûmetê û aliyên sivîl, texmîn dikin ku weke bûyerên hemkûf ên berê dîsa Wezareta Îtila`ata Îranê bo veşartina kêmasiyên xwe hin dosiyeyên sexte çê dike û kesên bê guneh pêve tometbar bike. Ya ku heya niha xuya ye kesek bi navê Riza Kerîmî, ji aliyê Wezareta Îtila`ata rejîma Îrane ve berguman e.
Di qada tolhildanê de jî ya ku tê diîtin, çavnihêriya pirranî serbarê tecrûbeya sala borî, dîsa her li ser Spaha Pasadaran e. bi awayekê Spaha Pasdaran tê haydan ku têkeve meydanê. Li dor Spahê wiha hatiye nivîsandin "mêrxasiya Spahê tenê li zincîre diramayan û ser şaşeyên telefîziyonan de ye". Lê tirsa xelk û çalakvanên sivîl yên Îranê zêdetir ji vê çavnihêriyê û haydana Spaha Pasdaran, ji tecrûbeya tolhildana kuştina Qasim Silêmanî ye û ditirsin ku dîsan tirajêdiyeke din weke ya balafira Okraynê bo veşartina neçariya xwe, biafirîne.

Di qada dorpêçên aborî û lihevhatina navkî bi Emerîkayê re jî, dîsan aliyên rejîmê gotinên cuda hene, lê pirranî alîgirê şopandina vê ne. Weke mînak Wezîrê Karûbarê Derve yê Îranê dibêje ku Îsraîl bi êrîşên xwe nikare me li cehd bo hilgirtina dorpêçan sar bike. Ji aliyeke din ve jî Mihemed Sedir, endamê civata parastina berjewendiyên rejîmê, vekişiyan ji danûstandinan di berjewendiya Îslayîlê de dibîne. Di demekê de ku rojnameya "Keyhan" di çarçoveya gotarekê de vekişiyan ji danûstandinên navkî baştrîn tolhildan ji Îsraîlê dide zanîn. Bi vî awayî xuya ye ku aliyê tundajo (Usûlgera) berevajî aliyên reformxwaz û berjewendîxwaz (Mihafizekar) hewil didin ku danûstandin werin sekinandin da ku berhingarî Îsraîlê bibin, lê kifş nekirine ka dê xêncî vekişiyan ji danûstandinan, dê bi çi terzeke din li hember Îsraîlê derkevin.

Şirovekarên Îsraîlê di vê bawerê de ne ku piştî êrîşên Arteşa Îsraîlê bo ser bingehên leşkerî û cebilxaneyên Îrane li Sûriyê, kuştina Muhsin Fexrîzade, kesayetiyê baş yê navkî yê Îranê û niha jî êrîşa ser Netenzê, Îsraîl hewil dide ku rejîma Îranê hajo meydana şer. Di vê rastê de "Ehud Yaari" şirovekarê Îsraîlî dibêje ku piştî êrîşê han, ji bilî îlana şer çî rêyeke din ji Îranê re nabîne.

Lê ya ku heya niha ji aliyê rejîma Îranê ve tê xuyakirin, nemaze piştî beşdarbûna nûnerên rejîmê di civîna çend rojên borî li Viyenê de, texmîn tê kirin ku rejîma Îranê vê carê jî him jiber ku bikare derfeteke din bo pêşdebirina çalakiyen xwe yên navkî û him jî bi hêviya kêmkirina zexta dorpêçên aborî, bo heyameke din stuye xwe bo aliyê danûstandinan ve biçemîne û Îsraîl û Arteşa wê bispêre Xwedê. Nemaze ku niha rejîma Îran ber bi hilbijartinên Serkomariyê ve diçe û naxwaze ku di hundir de jî bikeve rewşeke awarte de.

Nerîna Lîderan

“Kenneth F. McKenzie”:
“Rejîma Îranê rojane gefan li Amerîkayê û hevpeymanên wê dixwe”.

“Gabi Ashkenazi”:

“Bila welatên cîhanê alxahîn bin ku Îran ne îro rojê û ne jî di paşerojê de nagihe bi çeka navkî”.

“Salih Muslim”:

“Şer û aloziyên vê dawiyê yên li Qamişlo, lîstokên hikûmeta Şamê û Rûsyayê ne. Rûsya heman tişt li Eyn Îsa û Şehbayê jî kirin. Bi vekişandinê re xwestin tawîzan bigirin”.

“Hesen Rûhanî”:

“Danûstandina Bercamê 60 heta %70 ber bi pêş ve çûye”.

42 salan belengazî di bin siya rejîma faşîstên Tehranê de

N: Eskender Ceiferî

Ji sala 1979’an ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên serokkomariyê û hilbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendamê rastîn ê gelê xwe. Belkî sedemeke baykotkeran jî her ev e. Ji ber ku ew xwe, li Îranê xwedîmaf dibînin lê mafê wan hatiye zewtkirin.

Di 11 gerran de heft kes weke serokkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sînordar e û nikarin tiştekê bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hilbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hilbijartinan baykot dikin.

Di salên di navbera 1979’an de heya 1981’an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn. Lê serokkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981’an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehmedînijad her yek du salan serokkomar bûn. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînijad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwastin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hilbijarinên sala 2009’an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedînijad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasiya rejîmê, gelek dengan bi dest xwe ve bîne. Lê piştre wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedînijad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwediya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarîn deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di destpêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekişîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartina herî dawî ya 2017’an de 1636 kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarîn selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidîn li Tehranê bû. Wî deng neda yasaya bingehîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwediyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dengan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dûrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di

şerê lidijî Kurdan de li pişta Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de pişta Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dûrxistina wî ji posta serokkomariyê.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwast bibin berendamên serokkomariya Îranê.

Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009’an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedînijad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dengan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Kurd dibêjin eger Dr. Ebdulrehman Qadimlû serkirdeyê şehîd ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Fuad Mistefa Sultanî serkirdeyê Komelê bikariya mafê xweseriyê ji bo Kurdan ji Tehranê bistînin berî ku bêne terorkirin, dikarîbûn bibin berendamên serokkomariya Îranê jî. Ew dibêjin Komara Îslamî hewl dide hemû hêzên opozîsyonê, dijberên xwe û serkirdeyên wan jinav bibe. Fuad Mistefa Sultanî sala 1979’an li nêzîkî gundê Bestam li ser riya di navbera Bane û Merîwanê de hate terorkirin. Dr. Qasimlû jî sala 1989’an li Wiyena paytexta Austria ji aliyê terorîstên Îranê ve hate terorkirin.

Lê piştî 42 salan, para Kurdan, hîn her belengazî ye. Lewma jî ewê vê carê jî, hilbijartinên rejîmê baykot bikin.

Salek bi ser danûstandinên Kurdî-Kurdî re

N: Ebdulazîz Qasim

Her ji destpêka krîza Sûrî ji sala 2011'an ve, gelek hewl ji bo yekrêziya kurdî li ser binyatê peydakirina nêrîneke siyasî ya hevgirtî û hevbeş hatin dan, û di demeke nêzîk de û tevlî astengiyan, hewldan serkevtin bi damezrandina qebarekî yekgirtî bi navê Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS), bêyî tevlîbûna PYD ji ber nerazîbûna wê li ser rêjeya nûnerayetiyê di nav organ û dezgehên ENKS de.

Herwiha piştî peydabûna nakokiyan di navbera ENKS û PYD, bi însîyatîfa Herêma Kurdistanê gelek hewldan ji bo nêzîkkirina her du aliyan hatin rojevê, û di encam de hin peymanên girîng hatin îmzakirin, lê ji ber pênegiriya PYD, ew rêkeftin di pratîkê de li ser erdê nehatin bicîhanîn, wekî rêkeftina Hawler 1 di 6.11.2012, Hawler 2 di 12.23.2013, û Duhok 1 di 10.22.2014.

Di dawiya 2018an û piştî dagîrkirina Efrînê bi destê dewleta Tirkiyê ya dagîrker û çeteyên terorîst yên opozisyona Sûrî "îtîlaf", ji aliyê navnetewî destpêşxeriyek ji aliyê Fransî di destpêka sala 2019 de hat, û herwiha paşî însiyatîfek Brîtanî jî hat ji bo piştgirîya destpêşxeriya Fransî ji bo nêzîkkirina her du aliyan.

Piştî dagîrkirina Serêkaniyê û Girêspî di meha çirya yekê 2019'an de, ji hêla Mezlûm Ebdî, fermandarê Hêzên Sûriya Demokrat, destpêşxeriyek jibo yekrêziya Kurdî hat pêşniyar kirin, û soz da ku ji bo serkeftina wê bixebite, û wekî gavek ji bo nîşandana razîbûna xwe, Encumena Niştimanî ya Kurdî di reşmeha 2020'an de careke din ofîsên xwe ji nû ve vekirin yên ku ji aliyê PYDê ve hatibûn daxistin, kar û çalakiyên siyasî yên ENKSê hatibûn qedexekirin, û ji encamê danûstandinên di navbera fermandarê hêzên HSD û ENKS de, yekemîn gera danûstandinên kurdî-kurdî di nîsana 2020-an de, rasterast û cidîtir û bi çavdêriya Amerîkî-Fransî destpê kirin.

Li Hesekê di 16'ê Cehzîrana 2020'an de, di prêskonfiransekî hevbeş di navbera ENKS û PYNK de, bi amadebûna William Robak, balyozê Amerîka yê taybet di Hevpeymaniya Navnetewî de, û Mezlûm Ebdî, Fermandarê Hêzên Sûriya Demokrat, ji aliyê her du aliyan têgihiştinek li ser binyatê Peymana Duhokê ya 2014an hate ragihandin, û pêdagirî li ser berdewamiya diyalog û danûstandinên di navbera her du aliyan hat kirin ji bo îmzakirina peymanek berfireh û hevbeş li ser astên siyasî, leşkerî, parastin û rêveberiyê.

Diyaloga kurdî-kurdî her ji destpêkê ve, rastî gelek dijberî û bertekan ji hêla dewleta Tirkiyê ya dagîrker û opozisyona sûrî ya alîgirê Tirkiyê (îtîlaf) hat, herwiha ji ber helbijartinên serokatiyê yên Amerîka û çend daxuyaniyên nerênî yên cuda cuda û êrîşên li ser ofîsên ENKSê, danûstandin bi carekî hatin rawestandin.
Piştî bêhtir ji heşt mehan, ji bo destpêkirina danûstandinên Kurdî-Kurdî yên rawestandî, balyozê taybetî yê Amerîkî li bakur û rojhilatê Sûriyê, David Brownstein, li roja 9'ê nîsana 2021'an serdana ofîsa ENKSê kir ji bo gotûbêjkirina destpêkirina diyaloga Kurdî-Kurdî li gel Serokatiya ENKSê re, di heman demê de pêbendbûna Amerîka ji bo çareseriya siyasî li Sûriyê û timamkirina diyaloga kurdî dupat kir.

Piştî hatina serok Joe Biden, wisa xuya dike ku rewşa Sûriyê ji bo rêveberiya nû ya Amerîkî girîngiya xwe ya berê nîne, û li gor rapora salane ya nirxandina metirsiyên sala 2021'an de, raporteke ji aliyê CIA heye li ser berdewamiya nakokî û krîzên mirovahî û têkçûna rewşa aborî li Sûriyê di salên pêş de piştrast dike, bi awayekî xuya dike ku bidawîkirina krîza Sûrî hîn jî di rojeva Amerîkî de nîne.

Li gel vê yekê jî, hin siyasetên bingehîn yên hevbeş di navbera rêveberiya berê ya Trump û ya niha Joe Biden de li ser dosyaya Sûrî hene, di serî de parastin û ewlehiya Îsraîlê û şerê li dijî rêxistina DAÎŞ ya terorîst, herwiha rûbirûbûna hejmongeriya Îranê li Sûriyê û di navçeyê de, lê dibe ku mekanîzma rûbirûbûnê ji serdema Trump cuda be, û tê pêşbînîkirin ku dibe Joe Biden ji bo vê yekê li gel hin welatên mezin yên Ewropî nemaze li gel Fransa rêkbikeve.

Li gorî hin çavkaniyên nûçegehanî ku niha şandek ji Wezareta Derve ya Fransa li Qamişlo ye ji bo berhevkirina serdana şandeke kurdî ber bi Parîsê û dîtina Serokê Fransa Emmanuel Macron, lê heta niha tiştek nehatiye zelal kirin û li gorî heman çavkaniyan ku rolek mezin ya Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî derbarê vê tevgera Fransî heye, nemaze piştî serdana Parîsê di dawiya meha adara bûrî de.

Îro, doza kurdî li Sûriyê piştî dagîrkirina Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê, û malwêranî, koçberî û têkçûna barê mirovî û belavbûna korona bi awayekî berfireh li Kurdistana Sûriyê, berdewamiya rêveberiya xweser bi vî şêwazê tekalî û şikestî pêdivî bi rêkxistina navmala kurdî li ser hemû astên siyasî, leşkerî û rêveberî heye, pêdiviya lezgîn ji bo yekrêziya Kurdî heye, bi taybetî heger hat ku Amerîka li gel Tirkiya û dewletên Erebî li ser doseya Sûriyê rêkbikevin, ku niha Tirkiya dixebite li ser asayîkirina têkiliyan li gel welatên Erebî, helbet wê gavê wê berjewendiyên Tirkiya û Ereban serbikevin û doza kurdî wê tûşî ziyaneke mezin bibe û bi carekî dê bihête piştguhxistin.

Jîngeh û Siyaset



N: Bêhzad Qadirî

Rehend û qas, hin caran dikarin riwaleta bûyerekê bi giştî biguherin. Di pîvaneke hûr de, jîngeh û çalakiyên pêwendîdarên wê, belkî di çarçoveya komkirina zibil û surûşt yan dermankirina canjibereke ziyandîtî bêne sînordarkirin. Hin çalakiyên xeyresiyasî ku encamdana wan, netenê metirsîdar nîne, belkî kareke xêrxwazî ye! Kesanek, tenê di vê çarçoveyê de jîngehê dibînin, û li ser vê yekê rijd in ku wan çalakiyane sozdar bibînin û astengiyan bo wan çalakiyane çê bikin.

Ew dîtingeh û reftar, ku ji navendekê ve çûne nav aliyeke siyasî, metirsiya canî heye, renge bi riwalet perawêzeke aram bo komek li jîngehparêzan biafirîne; Lê siyasetvan û berpirsan vaksîne dike! wan diparêze da ku reftara bikarhênerî û li dijî surûşta xwe bi şiyaneke zêdetir berdewam bikin, vaksena nesiyasîkirina jîngeh, herwiha siyasetvanan li hember daxwaziyên jîngehî diparêze.

Di pîvereke mezin de, li wî cihê ku biryardanên berfireh li meydanê de ne, jîngeh dibe bi mijareke bi tewaw siyasî. Siyasetvan bi hêceta geşe û baştirkirina rewşa xelkê û li praktîk de bi sedema bipêşvebirina berjewendiyên xwe, bi giştî hin biriyaran didin ku nirxa wê ji berîka surûşt û welatiyan ve bê dan. Îradeya hevahengiya xelkê bona rizgarkirina topa erdê, vedigere bo dawiya sedsala 19 a Zayînî. Li Birîtaniya, piştî çendîn sal hewl û tekoşînê, Yekîtiya "Pêlamîc" ku piştre navê "Encûmena Şahî ya Xwedîderketin ji Balindeyan" li ser hate danînê, kesên xwedî desthilat anîne ser vê bawerê ku, şiyana yasaya qedexekirina bikaranîna perê balindeyan li pêşiya kincan erê bikin. Bi pîvereke hûrtir, hewla vê Yekîtiyê, berevanî ji balindeyan bû; Lê bi pîvereke mezintir, bê rolalîstina siyasetvanan û pejirandina yasa, wan çalakiyan nedikarî wiha berfireh bibe.

Hevdem digel ya ku di Birîtaniyayê de diqeqime, jîngehnasek yê bi navê "Can Mêyêr" li eylata Kalîforniyaya Amerîkayê de, encûmena "Sîyêra Kilab" ava kir. Wê encûmenê ji wê demê ve heta niha, siyasetvan xistine bin givaşan da ku bi pejirandina yasayên cor bi cor yên jîngehê, ji kontrolkirina jinavbirîna daristanan û kangehan ve bigre da ku avakirina deverên parastî û parastina corên canjiberan, di wan waran de roleke berçav lîstiye. Bê yasa û rêkarên bikêrghatî û birêveberiya serast ya wan çalakiyan, ew ji parastina jingehî ya çandina darên bi kom, dermankirina canjiberên birîndarbûyî û komkirina paşmaveyan, zêdetir geşe nedikir.

Di heyama wê niveya sedsalê de, gelek hewlên cîhanî bona geşekirina rewşa parastina jîngehê hatine dan. Di piraniya wan hewlan de, siyasetvan amade bûne. Peymana navnetewî ya guherîna keşûhewa li bajarê "Parîs"ê yek ji wan hewlan e. Hin welatên wekî Hindustan, Erebistan û Çîn, digel hejmarek ji wê peymannameyê nebûn. "Serkomarê Berê yê Amerîkayê "Barak Obama" ew peymannameye wajo kir lê, piştî sal û nîvek, "Donald Trump" ji wê peymannameya "Parîs"ê derket. Hekî ew çîrok û hûrdekariyên vê siyasî nînin, em dikarin çi manşêtekê bo danên?

Hebûna wezîr an serokê saziyên Jîngeh li kabîbneyên dewletan de, nîşaneyeke din e li sîyasîbûna pirsa jîngehê.

Gelek ji biryarên ku dewlet li aliyên avedanî û geşedanê de didin, li ser jingehê bandordar in. Ew dîtingeh ku parastina jîngeh ji çalakiyên encûmenan û komkirina paşmaveyan li surûştê sînordar dikin, destê biryardan bona kavilkirina jîngehê vekirî dêhlin, bê vê ku bandordarên kavilker yên projeyan li surûştê de bi micidî verbigrin.

Domandina birêvebirina projeyên kavilker û mifahwergirtina xirab ji jîngehê bo heyameke dirêj, mijarê ji rûkê siyasiyê ve bo rûkê ewlehiyê diguhere. Ew mijar li Îranê qewimiye. Bi salan e ku pirsgirêka av ku pirsa herî girîng ya jîngehê ye, bûye mijareke ewlehî û mizemiza wê basê, 10 sal berî niha digihîşte guhê Şêwraya Bilind a Tenahiya rejîmê, wê demê hewl hatibû dan ku dengê nerizayetiya werzêrên Îsfehanê bi kêmtirîn nirx bê fetisandin. Piştre çendîn caran ewlehîbûna pirsa avê hate pêş; lê hejmarek ji mediyakaran, xwe lê xafilandin. Niha ku bas bê aviyê bûye krîzeke micidtir, her ew mediyakarane bi ecêbgirtîmanê ve, nûçeya mudaxileya Şêwraya Bilind a Tenahiya Netewî ya rejîmê li ser pirsa avê, belav dikin.

Biryarên kavilkerên binav berpirsên Îranê di warê av û jîngehê de gihîştiye astekê ku, Serokwezirê Îsraîl "Bênyamîn Netanyahû" di çarçoveya piropagendeyekê de, pêşniyara alîkarîdan bo xelkê Îranê dide û radigehîne: "Rejîma Îranê heta şiyana birêvebirina avê di Îranê de nîne û mijûlê jinavbirina jîngeh û surûşta welat e.
Di Îranê de , siyaset ku ji rojên destpêkî yên çalakiyên jîngehî ve hate nav vê prosê, îro zêdetir ji her demekê, xwe dide nîşandan. Bi cihê înkarkirina siyasîbûna jîngehê di pîverên mezin û biryaran de, dibe qebûl bikin û di hizra çareyekê de bin ku jîngehparêz hêza siyasetvaniyê hîn bibin û jîngeparêz bona dabînkirina paşerojeke geş bi berdewamî dibe daxwaziyên wan hebin.
Bê şiyana hêza siyasî di warê jingehê de ku bikarî yasên bi wec pê erê bikî, hewlên parastina jîngehê ji xwedîderketin li surûşt, komkirina paşmaveyan û dermankirina canjiberên birîndar, zêdetir geşe nake, herwisa şiyan û taybetmendiyên ekolojîkî yên ekosîsteman dê lawaz bibe û her core belayek wekî hewayê bi toz, û heta betalî jî, bo xelkê dê bê pêş. Bi Siyasîzanîna jîngehê, rê bo bihêztirkirina jîngeparêzan vedike û paşhatên bandordarên wan jî, bihêztir dike.

DESTANA RIZGAN Û NÛRÊ

N: Occo Mahabad

Hîma vê destanê li ser evîneke negihîştî û azarkêş hatiye afirandin. Aliyekî hezkirineke mezin û fedakar, lê li aliyekî din bedbextbûneke kesernak û wêranker tê dîtin. Çavkaniya vê destanê jiyana me ya rojane ye ku her ro li herêmekê rastî me tê. Di vê destana klasîk û xelkî de motîfên sereke eşq, evîn, hevnegihiştin, êşkişandin, bêrî, hêvî, fedakarî, berxwedan, tirs û mirin in.

Di destanê de em dibînin ku çînên serdest, hêzdar û dewlemend çînên bindest û kedkar biçûk dibînin, qîzên xwe layiqî wan nabînin.

Dengbêjên me vê destanê di meqama klamkî de û bi awayekî kurt vedibêjin, lê çîrokbêjên me ji gellek aliyan û bi detayî ji me re neqil dikin. Rehmetî meta min çîrokbêjek pirr jêhatî bû, dikaribû bi saetan ji we re qala destan û çîrokên cur bi cur bikira. Ez ê hewl bidim ku ji devê meta xwe vê destanê ji we re binivîsim.

Rizgan û Nûrê aşiqê hev in û bi salan e hev hez dikin lê Rizgan şivanê gund e, feqîr e, belengaz e, bê mal û milk e, xortekî camêr û dilsoz e. Ne neheqiyê dike ne jî neheqiyê qebûl dike, merivekî dilgeş û adil e.

Nûrê qîzeke bedew bû, husn û cemaleke wisa lê hebû dema meriv çav pê diket, te digot qey horî ye ji bihuştê reviyaye hatiye li kêleka Rizgan rûniştiye. Meriv dêna xwe bida wek ava kevserê bû, dilê xortan pê tev kûl û birîn bûn.

Bavê Nûrê serdestê gund e, dewlemend e, dixwaze qîza xwe bide mirovekî zengîn û wekî xwe bi nav û deng. Li ber çavê wî, merivên feqîr rût û tazî bûn, xêr jê nedihatin, ew xwe bikuşta jî qîza xwe nedida feqîrekî.

Occo kurapê Nûrê ye, girêdayî erf û edetên xwe ne, herî zehf nêçîran hez dike bi taybetî nêçîra kêvroşkan. Occo jî wekî apê xwe merivekî dewletî û hêzdar e. Ji zarotiyê heta xortaniya xwe bi Nûrê re mezin bûye, bi salan e dil berdaye Nûrê. Sibê zû radibe ji vê deştê bigire heta vê qûntarê, Nûrê berê xwe bide kuderê şev û roj li pey Nûrê mîna siyekê digere, bi dizîka çavdêriya wê dike. Occo naxwaze ku Nûrê bi Rizgan re bizewice. Merivekî çavsor, hesûd û zalim e.

Çend caran malbata Rizgan ji bo xwezginiyê diçin mala bavê Nûrê lê di her çûyînê de bi destvala vedigerin. Bavê Nûrê Rizgan biçûk dibîne, dilê wî tune ku qîza xwe bi şivanekî re mêr bike. Rizganê belengaz çi dike çi nake nikare bigihîje miradên xwe.

Rizgan bi rojan difikire, dawiyê biryar dide ku wê Nûrê birevîne şikefta Qûlî. Biryara xwe dibêje Nûrê lê Nûrê naxwaze Rizgan wisa bike ji ber ku qîzrevandin işê namûsê bû li gorî kevneşopiyên civakî dawiya revê kuştin û mirin bû.

Nûrê bi lavayî bang dike Rizgan:
Bê de lolo lolo lolo…
Rizgan ez bi qurban nizanim
bextê min bû yan talihê te bû?
Berfanî berfa nerm e.
Heyrano rûkê erdê kiriye wekê çerm e.

De tu were min porkura Xwedê nerevîne, nebe Şikefta Qulî.

Şikefta Qulî şikeftekî cihê bê warî, cangê kurapê min nêçirvan e.

Sibê zû radibe, pey kevrûşka digerine.

Ax Rizgano ez bi qurban, tu were îzê bîne ser me, min bikuje.

Lo te jî ser da axx?”

Bê de lolo lolo lolo…lolo Rizgano Bê de lolo lolo lolo…

Rizgan guh nade Nûrê, bi hespê xwe yê qemer û qewî wê direvîne şikefta Qûlî. Şikefta Qûlî cihê aşiq û evîndaran e, ji gund dûr e, ewle ye. Her evdê Xwedê nikare derkeve serê şikeftê, li ser zinarekî bilind û asê ye.

Piştî revê herdu dilketî û evîndar diwestin, Rizgan gazî Nûrê dike:

Rizgan go Nûrê, wa Nûre, were qasekî çoka xwe bide erdê,

Ezê serê xwe bidim ser çokê ye.

Nûre çoka xwe dide erdê, Rizgan serê xwe dide ser çokê ye.

Kete xewê û xewnê ye.

Ji xewa şêrîn bazda go Nûrê, wa Nûrê! Mala bavê lê xerab bûyê!

De rabe minê xewnekî dîtiye.

Ezê xewna xwe bibêjim, tu porkura Xwedê xewna min şirove bike axx.

Ê de go; “min dîtibû darekî li derê mala bavê te şîn bûye.

Wê darê du çiqil, her çiqil sêvekî, her sêvê kewekî gozel li ser e.

Minê bala xwe dayê teyrê qereqûşê jor de li serê herdû kewa gozel difirî ax.”

Rizgan bi tirs ji carekê ve behsa xewna xwe dike, Nûrê xewna wî dibihîse direcife, tirs û xofeke mezin û bêhempa dikeve dilê wê. Qîzrevandin karê mêran e lê dawiyê kuştin û mirin e. Dizane ku bavê wî niha ji bo dîtin û kuştina wan, kurapê wê Occo peywirdar kiriye. Occo zalim e çavsor e, ew ê xwîna wan birijîne bo namûs û mêraniyê.

Bang dike Rizgan, tirsa xwe jê re şîrove dike:
Nûrê go; Rizgan ez bi qurban,
Xwedê xewna te bi xêr ke.
Dara derê mala bavê min ji bejna min e.
Herdû çiqilê pêva bext û mirazê min û te ne.
Herdû sêvê li ser, memikên min in.
Herdû kewê gozel eslê rihê me ne.
Teyrê qereqûçê Occo’yê kurmamê min ê nêçîrvan e.
Sibê zû radibe, pey kevrûşka digerîne.
Ax Rizgano ez bi qurban, tu were îzê bîne ser me, min bikuje.
Lo te jî ser da axx.
Bê de lolo lolo lolo…lolo Rizgano… Bê de lolo lolo lolo…
Rizgan dibê netirse Nûrê aş be, heke Occo mêr be ez jê mêrtir im. Çima destê Occo bi çek e yê me bi text e.

Nûrê tê cem Rizgan, dikeve hembêza wî ya êgir, dilê xwe dike nermenerm. Lêvên xwe datîne ber qeraxa devê Rizgan laşê xwe dike germegerm. Hev şa dibin pev şa dibin kelekel. Dikevin xew û xewneke giran heya ber sibê. Nûrê bi qebqeba kewan hişyar dibe.
Sibe bû, kubara sibê ye.
Nûrê derdikeve ber derê şikeftê ye.
Dinêre Occo xuya ye jêr de tê ye.
Nûrê diçe pêşiyê Occo.
– “Occo ezê bextê te de me,
Were Rizgar nekuje xortek heyf e, take tenê ye.
Were min porkura Xwedê bikuje,
Poz û guhê min jê ke, têke cêva xwe de.
Sibê ro nava eşîrê derxe. Him te re nav e, lo him namûs e ax.”
Bê de lolo lolo lolo…lolo Rizgano…

Teyrê qereqûşê Occoyê zilimkar, bi fermana bavê Nûrê hatiye ji bo kuştina herduyan. Occo Nûrê guhdar nake, bi sîle û şeqamên nexêr canê wê diêşîne, berê Nûrê dikuje pişt re Rizganê di xew û xewnê de ye....

Destana Rizgan û Nûrê bi trajediyeke mezin bi dawî dibe. Nahêlin herdu evîndar bigihîjin miradên xwe û bi bextewarî jiyanek ava bikin. Di destanên evînî de taybetiya sereke hevnegihîştina aşiq û dildaran e. Tucarî derfeteke gengaz peyda nabe ku pevre emrê xwe derbas bikin.

Cudahiyên çînî, civakî û takekesî di vê destanê de pirsgirêkên herî mezin in. Malbatên dewlemend merivên kedkar, karker û feqîr biçûk dibînin naxwazin qîzên xwe bidin wan. Ji ber vê yekê her meh bi dehan civanên Kurd ji bo mehneya namûsê tên kuştin. Heke em derdora xwe baş mêze bikin em ê bibînin ku li Kurdistanê bûyerên bi vî şiklî her ro diqewîmin, gellek Rizgan û Nûrê di civaka me de bi pisgirêkên wisa re rû bi rû dimînin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Kuştin û birîndarbûna 12 kolberan di meha Xakelweya sala 1400`an de

Li gor amara ku ji aliyê Saziya Mafê Mirov a "Kurdpa"yê ve hatiye tomarkirin, di meha Xakelweya sala 1400`an de, bi giştî 12 kolber hatine kuştin û birîndarbûn.

Kuştî: 3 kes

Birîndar: 9 kes

Kuştin û birîndarbûna wan kolbera bi vî awayê ye:

Teqa rasterast a hêzên leşkerî yên Îranê: 8 halet

Teqeya hêzên yên Artêşa Turkiyê: 2 halet

Bi sedema sir û seqemê: 1 halet

Li meha Xakelêweya sala 1400`an 12 kolber li ser sînorên; Selmas, Newsûd, Şino Çaldiran, Bane û Serdeştê hatine hatine kuştin û birîndarbûn. Dibe bê gotin:

Fehîm Mamendqizilkendî, xelkê bajarê Selmasê, li destpêka sala 1400`an, bi sedema sir û seqemê li ser sînorê bajarê Selmasê canê xwe ji dest dabû.

Hesen Keçelanlû, xelkê gundê "Balixçî" yê ser bi bajarê Çaldiranê, li rêkevta 26`ê Xakelêweya sala 1400`an, bi sedema teqeya lêzên leşkerî yên Artêşa Tirkiyê, li ser sînorê bajarê Çaldiranê canê xwe ji dest dabû.

Herwisa, Hîwa Qadirî xelkê bajarê Serdeştê, li rêkevta 28`ê Xakelêweya sala 1400`an, bi sedema lipeykevtina hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê û berbûn ji bilindahiya sînorê "Sarduwa" yê ser bi bajarê Serdeştê canê xwe ji dest dabû.

Li gor amara ku ji aliyê Saziya Mafê Mirov a "Kurdpa"yê ve hatiye tomarkirin;

Li sala 1399`an bi giştî 231 kolber li Kurdistana Îranê hatine kuştin û birîndarbûn. (58 haletên kuştî û 173 haletên birîndarbûn)
Ev amare bo 9 salên derbasbûyî yên Rojî (li destpêka sala 1390`an heta dawiya sala 1399`an), bi giştî 1506 kolber bûne. (515 kuştî, 968 birîndar û 3 kolber jî bê serûşûn in)

Amadekar: Evîn Mistefazade

Li sînorê Çaldiranê 2 kolber ji aliyê hêzên Artêşa Tirkiyê ve hatine kuştin û birîndarkirin

Şeva Pêncşemî 26`ê Xakelêwe, kolberekî Kurd yê bi navê "Hesen Keçelanlû", xelkê gundê "Balixçî" yê ser bi bajarê Çaldiranê ji aliyê hêzên Artêşa Tirkiyê ve, hate kuştin û kolberekî din yê bi navê "Behram Semedî", kurê Xalis û xelkê gundê "Îsagulîk" yê ser bi bajarê Çaldiranê, bi dijwarî hate birîndarkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, hêzên Artêşa Tirkiyê, li sînorê "Naywere" yê ser bi bajarê Çaldiranê, teqe ji wan 2 kolberan kirine û li encama teqeya hêzên Artêşa Tirkiyê, "Hesen Keçelanlû", canê xwe ji dest da.

Herwisa wê çavkaniyê got: "Behram Semedî, piştî birîndarbûna wî li wê bûyerê de, ji aliyê hêzên Artêşa Tirkiyê ve hate binçavkirin û bi awayekî dijwar dane ber lêdan û îşkenceyê".

"Behram Semedî" niha li yek ji navendên dermanî yên bajarê Çaldiranê, tedawiya pizîşkî bo wî tê kirin.

Dayîkek digel 2 kurên xwe li bajarê Pîranşehrê hatine binçavkirin

Sibêdeha roja Şemî 28`ê Xakelêwe, jineke Kurd ya bi navê "Gulale Muradî" digel 2 kurên xwe yên bi navên "Metîn û Tahir Bezazî" xelkê bajarê Pîranşehrê, ji aliyê hêzên ewlehî ve, hatine binçavkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, ew 3 welatiyên Kurd piştî kuştina endamê Spaha Pasdaran yê bi navê "Osman Hacîhusênî", ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Herwisa wê çavkaniyê got, ew 3 welatiyên Kurd, bona lêpirsînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmiyê hatine veguhastin.

Pêka gotina çavkaniya agehdar a "Kurdpa" yê, piştî binçavkirina wan 3 welatiyên Kurd, ti zaniyariyek li derheq qedera wan ber dest nîne.

Roja Înê 27`ê Xakelêwe, "Osman Hacîhusênî", endamê Spaha Pasdaran li bajarê Pîranşehrê hate kuştin.

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (396)

Tu ji wan şoreşvanan bûy ku tim di çeperê de dimînin

Te di rêbaza Qasimlo de wate da jiyanê û

ji sêdara Qazî fêr bûy ku mirin li cem pêşmerge bê wate ye

Tu hevçeperê rastbêj ê şoreşê û hevalê hertimî yê

şehîdan û xweragiran bûy